## 25 salvegera Mala Êzdiyên Emmerich – Serkeftin yan jî agirkujî?

**Emmerich** yek ji bajarê eyaleta Westfaliya bakûr e. Bajar di sala 700î de, ji hêla Willibrord ve, wek "şemendefereke misyoneriyê" hatiye damezrandin. Di sala 1961 de di nava Tirkiyê û Almanya de **girêbesteke kar** hate girêdan. Bi rêya vê girêbestê hinek Êzdî yên bakûrê Kurdistanê jî hatin Emmerich û Celle. Lê vêga ji bilî hinek kal û pîra û hinek jî ciwanan pîrr kêm Êzdî li bakûrê Kurdistanê mane. Êzdiyên vê deverê ji mêj ve hatine naskirin û bûne hemwelatiyê Almanyayê. Herwiha hinek ji wan wek karsaz û hinek jî wek akademîker dixebitin. Lê bidaxwe, zarok û ciwanên li vê heremê jî bi kurdî pirr kêm dizanin! Loma ew bi hev re bi zimanê almanî diaxifin û dinivîsin. Beşek ji wan ji çand, ol û baweriya xwe dûrketiye; herwiha kes û karên wan **têkçûne, bi tenê mane**.

### Komela Êzdiyên Emmerich

Bi hatina Almanyayê re hinek Êzdî tevlî xebatên rêxistinan bûn û wiha fêrî xebatên siyasî û komelayetî bûn. Dûre dest bi damezrandina rêxistinên xwe kirin. Di destpêka salên 1990î de tenê çend komele û dûre jî "serkomela"[1] yekemîn hatin avakirin. Di 26.09.1993an de, **Komela Êzdiyên Emmerich** tê damezrandin. Di 1994an de, ji bo meşandina xebat û çalakiyan rêveberî bi alîkariya civakê malekê vedike. 2003an de rêxistin heman malê dikire û ji 2010an ve deynê kirîna male ne mane. Mal vêga milkê rêxistinê ye. **Di destûra xwe de, M.Ê.E. - Mala Êzdiyên Emmerich dinivsîne ku ew ne girêdayî tu aliyên siyasî ye û <u>wê van armancên li jêr pêkbîne;</u>**

- *Rêxistina semîner û civînên li ser bawerî û çanda Êzdiyatiyê.*
- *Rêxistin û pîrozkirina îd û cejnên Êzdiyatiyê.*
- *Xebatên çareserkirina pîrs û pîrsgirêkên di navbera malbatên Êzdîyan de.*
- *Xebatên çareserkirina pirs û pirsgirêkên zarok û ciwanan.*
- *Xebatên entegrasyonê, anî têkelbûnê.*
- *Xebatên dîplomasî û yên danasîna Êzdiyatiyê[2] di heremê de.*
- *Parastin û pêşxistina mirat- û çanda zindî ya Êzdiyatiyê.*
- *Pêşxistina hevkarî û tifaqê di nav civaka Êzdî de.*
- *Parastin û perwerdekirina Êzdiyan ya ol-, û* çandî.
- *Xurtkirin û parastina mafê Jina Êzdî.*

Ji ber pirsgirêkên cûda, çûna welat ji bo hinek malbatên Êzdî li Almanyayê barekî girane. Ew, hertim nikarin meytên miriyên xwe bişînin welat, loma li Emmerich, Kleve, Goch û vêga jî li Kalkar "beşên goristanan" ji Êzdiyan re hatine *(tên)* cûdakirin.

Di sala 2011an de, cara yekemîn Bavê-Şêx û hinek endamên "Civaka-Rûhanî" dibin mêvanên vê rêxistinê. Ciwanên vê male, bi navê „Ciwanên Mala Êzdiyên Emmerich" komeleke ji bo ciwanan didamezrînin. M.Ê.E. û Komela Ciwanên malê piştî komkujiya ji hêla tundrewên Îslama faşîst ve xebatek berçav ji bo Êzdiyên *(penaber/koçber)* li Şengalê li Herêma Hikûmeta Kurdistan û revendê dimeşînin.

---

[1] Serkomele ya yekemîn „Y.Ê. – Yekîtiya Êzdiyan" di 1993an de, „Y.Ê.K. – Yekîtiya Êzdiyên Kurdistan" di 1996an de û dûre jî bi navê „F.K.Ê. – Federasyona Komeleyên Êzdiyan" di 1997an de li Bielefeld (Almanya) tê damezrandin. *Ji 2016an ve F.K.Ê bi navê NAV-YEKê dixebite û serkomelek bi "bandor û çalak" e, di nav Êzdiyên cîhanê de.*

[2] M.Ê.E. 2012an bi navê „Die Eziden – Religion, Verfolgung, Flucht und Diaspora" kovarek biçûk û tijî şaşiyên têolojîk, ziman, çandî û dîrokî *hw.* ***tawanbariyên Prof. Dr. Andreas Ackermann*** *(Rûpel 12)* diweşîne.

Li gor rêveberiya M.Ê.E dora 350 endamên wê hene û têkiliyên wê yên xurt bi hinek „şaredar, rêxistin, parlamenter, şexsiyet û olan“ re heye. Jî ber hinek “pirsgirêkên neçareserkirî”, serkomela F.K.Ê endamtiya M.Ê.E[3] di roja 02.04.2016an de radiwestîne. M.Ê.E di 2016an de dibe endamê Z.E.D[4], lê hêj jî hinek ji remz û ramanên NAV-YEKê bikartîne. Vêga hem civaka Êzdî li vê heremê û hem jî M.Ê.E bi gellek pirsgirêkên neçareserkirî[5] yên civakî, olî û rêxistinî re rû-bi-rû mane.

**Xwendevanên hêja,** ev bû 35 sal ku ez “di nava civak û rêxistinên Êzdiyan” de dixebitim. Xebat, destpêşxêrî, çalakî û hemû pirsgirêkan ji nêz ve dişopîn im. Rewş û baredoxa rêxistinan li gel kêmkuriyên wan dinas im. Loma, min nexwest tenê “pîrozbahiyek ji rêzê” û tenê xebata M.Ê.E binîrxînim. Ji xwe pezindan me pêşnabin û kêrî me nayên. 25 sal xebat, xwebexşî û têkoşîn di barê komelkarî de kedeke qurs û pirr bi nirx e. Bo min ev ked û xebata Mala Emmerich ciyê dilxweşî û şanaziyê ye! Loma, ez hemû rêvebir û endamên vê komelê bi dil û can pîroz dikim.

## Serkeftin yan jî agirkujî?

Êzdiyatî bingeha felsefa kurdperwerî, aştîxwazî û xwezaparaztiyê” ye. Êzdiyatî ne tenê oleke kevnar û ji rêzê ye. Ew **“mîrata çanda Mesopotamyayê”** ye. Şênewarnasên serdema me şop û şûnwarên vê baweriyê di erdnigariya Kurdistan de pirr bi nirx nîşan didin. Devara Xirabreşkê[6] *(Göbeklitepe)* ya ku zêdetirî 12.000 sal kevnare tenê sparteke ji bo vê erdnigariya pîroz. Lê, bidaxe Selçûk û Roma-Reş di serdemên desthilatdariya xwe de hemû zîyaret, perestgeh û cihên Êzdiyatiyê bi zanîn û rêkûpêkî rûxandin. Wan li hemû şênwarên bav û kalên me pirraniya “goristan, medrese û mizgeftên” xwe avakirin! Mizgefta Îsak Paşa li Bazîdê; Ulu Camî ya Êlih, Mêrdîn, Amed û deverên din tenê hinek mînakên vê rûxandinê ne. Dîyar e, şênwarê Êzdiyatiyê “xaka Kurdistan, ya pirreng û pîroz e”. Êzdiyatî “şûr û benda” parastina çand, dîrok (mejû) û “ZIMANÊ KURDÎ” ye. **Netewa kurd xwedî bawerî û dîrokeke bêhempa, herwiha “ne nivisî” û mixabin hêj jî ne naskirî ye!**

Neyar û dagirkerên Kurdistana dabeşkirî, hem bi rêyek nijadperestî û hem jî bi rêya “Îslama tundrew” hertim hêrîşî civak, çand, dîrok û baweriyên Kurdistanê dikin. Wan bi awayekî hovitî û bi taybetî jî Êzdiyatî ji xwe re kirine armanc; dixwazin kurda û hemû nirxên nasnama wan ji holê rakin, wan ha xulam û bişaftî bihêlin. Ev hêrîşên ku ta serdema me berdewamin, yek ji pirsgirêk û sedemên “serekî” ne, ku nahêlin “demoqrasî, mafên mirovan, abori, teknolojî û aştî” hem li Kurdistan û hem li Rojhilata Navîn pêşbikevin û mirov bextewar bijîn. Loma, netewa me, li ser xaka xwe, hîna jî ji azadî, biratî, serxwebûn û dewletbûnê dûre!
Dr. Cemal Nebez, lêkolînerê navbang û kurdzanê wêrek, di barê pirsgirêka kurd de wiha dibêje; ***„Ev bû 1400 sal ku kurd xulamtiya Îslamê dikin û ev bû 1400 sal jî Îslam neyartiya kurd û Kurdistanê dike[7]“.***

---

[3] Li gor arşîvên FKÊ; M.Ê.E û serokê wê Nedim Erkiş ne tenê yek ji damezranerê Y.Ê/YÊK û F.K.Ê ye. Ew di heman demê de ew ta 2016an jî yek ji endamên çalaktirin e, xwedî kedek berçav û beşek ji tekoşîna F.K.Ê ye.

[4] Z.Ê.D. – Zentralrat der Eziden in Deutschland/Navenda şêwirdariya Êzdiyên Almanyayê di 2016an de û li piştî pêvajoyên damezrandina „Hevkariya Komelên Êzîdiyan li Elmanya“ *(08.05.2004)* û „Z.Y.D. – Zentralrat der Yeziden in Deutschland“ (29.09.2007) de hatiye damezrandin.

[5] Mînak: Tekoşîna di barê standina gundê **„Kelhokê“** de wek şerê dîrokî yê nava **„DAVÎD û GOLIAT“** e. Zor û çetîn e, lê ne bê wate û hêvî ye! Hinek partiyên kurd vedibêjin; „Êzdî kurdên resen in“, lê hîna jî ew ne xwediyê projeyeke dilsoz û werek in, ji bo dikaribin „KURDÊN RESEN“, bapîrên xwe ji komkujî û tinebûnê biparêzin.

[6] 1960î arkêologê amerikanî û dûre jî (1994) yê alman „Klaus Schmidt“ ji DAI rastiya Xirabreşê vedikolin.

[7] Bi ya min, divê kurd êdî bi wêrekî û vekirî li ser „danûstandin“ yên xwe bi Îslamê re bifikrin û biaxifin – dest bi lêkolînên zanistê li ser pirsgirêka ku ka bi rastî „Îslamê çi da ye kurda û çi jî ji kurd û Kurdistanê standiye“ bikin.

Bi sirûda **"Em serê xwe didin, lê teqez sirra xwe nadin!"** Êzdiyan ji neçarî "qirkirin, talankirin, penaberî, kocberî û ferman[8]" qebûl kirin - lê xulamtî, brakujî, xapandin, **"tirkbûn û erebbûn"** qebûl nekirin. Êzdiya bi hêsanî xwe radestî "kokneyarên" xwe nekirin. Di dawî de, Roma-Reş û vêga jî Xelîfata Îslam ya bi navê DAÎŞ li Îraq û Sûryê *(vê carê)* helweşiya - **lê, Êzdiyatî[9] ma!**

Bêguman, 1400 salên dawî, yên tijî "ferman, nepakî, bêmafî, bişaftin, tawanbarî û pêşderaziyên bê bingeh", şop û birînên kûr, di mejûyê tevayî yên Êzdiyan de hiştine! Her ji bo parastina xwe û bi pêzanîna ku "çiyayên Kurdistanê" dilsoz in, Êzdî hertim neçar man ku xwe paşvebikşînin û di gundên "bê kareba û dibistan" de bi awayekî terî û veşartî bijîn. Êzdiya ji metirsiya bişaftina xwe nedikaribûn zarokên xwe bişînin dibistanan û ne jî dikaribûn bi destên xwe zarokên xwe perwerde bikin. Di dibistanên biyaniyan *(mînak, yên tirkan)* de, zarok dihatin tewandin *(bişaftin)*, axaftina bi kurdî qedexe bû, tenê bîrdoziya dewleta serdest û ya Îslamê bingehên perwerdê bûn. Hem di navbera "ne-xwendîn û metirsiya têkçûnê" û hem jî di nav dû pergalên ku "hebûna" Êzdiyan teqez qebûl nedikirin de, wek **civakeke dîlgirtî bûn**! Ne yasa ya dewletê û ne jî ya Îslamê rê dida ku Êzdî jî xwe birêxistin bikin, dezgehên xwe damezrînin. Herwiha **li Tirkiyê û li bakura Kurdistanê mal, komel, partî û dezgehên Êzdiyan tine bûn.**

Di salên 80î de, dewlêta tirkan Êzdî bi rêkûpêkî kirin armanca herîşên mirovkujî û siyasî, ji wan xwest ku ew *(jî[10])* li diji şerkerên PKKê tevlî caşan bibin. Êzdî neçar man penaberiyê, herwiha wundakirina mal û milkê xwe, kuştina xwe qebûl bikin, lê wan teqez wek hinek kurdên misilman nepakî nekir û çekên dijmin li dijî netewa xwe bikarneanîn. Bi ne qebûlkirina caştiyê û hatina revendê re, Êzdî neçar man, mal û milkê xwe bispêrin hinek cîran û kirîvên xwe û bi vê rêyê dev ji welatê bavûkalan berdan. Divê bê zanîn, ku Êzdî di welatê xwe de, ji xwendin, xwendina bilind û ezmûnên jiyana "bajarî" û "xebatên rêxistinî" bê parbûn. Heman Ezdî ne amadekirî ji nav civakek "kollektîv" û welatekî paşvemayî hatin derxistin – ne amadekirî ketin nav cîvateke pirreng, cûda û biyanî, bi pergaleke azad, pirr pêşketî, demoqrat û yek kesayetî.

## Rêxistinên li Almanyayê

Vêga bêtirî 50 rêxistinên Êzdiyan li Almanyayê hene û hêj jî yên nû tên damezrandin. **Berî Fermana-Şengalê jî rewşa Êzdiyan li welat û revendê karasat û metirsîdar bû!** Loma min di 26.08.2013an de gotareke bi navê "**Tifaq ne tawanbarî ye, lê tifaq dilsozî û kirine!"** û di 05.02.2014an de gotara bi navê **"Serokê Êzdiyan kî ye? – Leaderless-Group - yan jî "pezê bê şivan"** weşandin. Min hinek pirsgirêkên-navendî yên civakê û rêxistinên Êzdiyan herwîha girtina tevbîrên zarûrî di gotarên jor de, bi armanca "xurtkirin û parastinê" nav û tarîf kirin. Mixabin, ji bilî hinek ciwanên Êzdî, tu berpirsên Êzdiyan ev hişyarî dilsoz negirtin! Ez îroj dilşkesî me, ku komkujiya Şengalê[11] bû sparteka rastiya hinek rêxne û zarûriya pêşniyarên min.

**Komkujiya Şengalê micaleke dîrokî?** Albert Einstein wiha vedibêje: **"Di her qeyranekê de micalek jî heye"**. Fermana-Şengalê, hevkarî û xîreta xwe-parastinê di nav Êzdiyan de zindî kir. Êzdiyên seranserî cîhanê û heta gellek qîz û xortên ku ji civak

---

[8] Mîtolojî/têolojiya Êzdiyatiyê bi „wate" behsa „72-Fermanan" dike. Îroj, hinek Êzdî, di mijara dîrokê û „Komkujiya Şengalê" de, behsa „73" yan jî „74" fermanan dikin. Ev yek ne naskirina dîrok û têolojiya Êzdiyatiyê îspat dike.

[9] Îroj, hîna jî bi sedhezaran Êzdî li Kurdistanê di kampa de ne û ji wan jî 85% bêkar in. Bi damezrandina „Herêma Hikûmeta Kurdistan" û dûre jî bi hatina DAÎŞê, Êzdî neçar man, bi girseyî, terka mal, milk û welatê xwe bikin.

[10] Bi dehhezaran kurdên misliman „köykoruçu/caşî" qebûlkirin û bi hezaran gêrîlayên PKKê şehîd kirin. Dewletê bi rêkûpêkî û alîkariya pirraniya mele û sofiyên Kurd, ta îroj „Kurda bi destê Kurda" dide kuştin, girtin û frotin.

[11] DAÎŞ, "dijminên mirovatî û şagirtên Îslama siyasî û tundrew", di 03.08.2014an de komkujiya Şengalê pêktine.

û ola xwe sar- yan dûrketibûn, rabûn ser piya û xwe li herderê birêxistinkirin. Ha jî, hinek guhertinên dîrokî pêkhat in. Gelo, ev pêvajo ji hêla berpirs û rêxistinên Êzdiyan ve wek “şans” hat bikaranîn – yan jî ne amadekirî ev “xîret” tenê “hestek demkî ma?

Bîan xwe bi hêsanî dikarin bikin “model û rêvebirên” mirov û civakên nezan û bê HÊZ. Li welat, Êzdî bi rêkûpêkî dihatin “reş- û biçûkkirin”. Bi kar û mijarên wek “Êl, ol, erd û xwedîkirina ajala” ve dihatin mijûlkirin. Ma gelo, îroj **dîsa** Êzdî bi mijarên wek;

- *Êzdî kurd in yan jî na?*
- *Êzdî Zerdeştî ne yan jî na?*
- *Êzdî têkelî civaka Almanyayê bûne yan jî na?*
- *Êzdî çima “QELEND” distînin, qîzê xwe difroşin?*
- *Êzdî çima “zewaca bi zorê” dikin?*
- *Êzdî çima “kuştina bi navê namûsê” dikin?*
- *Êzdî, Êzdiyatî û siyaset “ev dibe yan na”?*

nayên xapandin û mijûlkirin? Ma ev mijarên jor jî, ne percek ji siyaseta “parvebike û rêvebibe” ne, ya ku bi rêkûpêkî dixwaze Êzdiyan nezan, bê tifaq û HÊZ bihêle? **Loma, ez vêga dîsa dixwazim ji hemû berpirs û tevaya civakê bipirsim:**

- Pirraniya berpirsên ku ne li gor hindek pîvanên[12] kifşkirî û zarûrî tên helbijartin, ne pisporê karê xwe û ne jî yên Êzdiyatiyê ne. Gelo, hîngê ne normale ku pirraniya van ji berjewendiyên rêxistinê xwe û yên Êzdiyatiyê bêtir, **berjewendiyên XWE diparêzin? Ev “berpirs û serok” tên qontrol kirin?**
- Dûnav, Şêx û Pîrê “qaşo” berpirsê ve olê, yên ne pisporên Êzdiyatiyê ne û ne jî tên perwerdekirin, ma dê cewa û kîjan Êzdiyatiyê biparêzin û bi mirîdan bidin hes- û qebûlkirin? **Ev Êzdiyatiyê xwedîdikin – yan Êzdiyatî wan xwedî dike?**
- Bi lezgînî û germî, lê ne bi rêkûpêkî û profesyonelî rêxistinên nû tên damezrandin. Dûre, gellek ji van rêxistinan di bin barê xebatê de têkdicin û xwe bi pêşderaziyan li ser civakê ferz dikin. **Gelo, ji xeynî Êzdîyan kî serok, berpirs, xebat û rêvebiriyên “ne-serkeftî” dîsa jî dinas- û qebûldike?**
- Eger, li piştî 50 salên revendê û 30 salên xebatê hîna jî “dûnav[13], berpirs û akademîkerên Êzdiyan” wek **mînak;** semînerek perwerdekirina dûnavan, enstitûtek têolojiyê, kursiyekî lêkolînên zanistê, dibistan yan hêlînên zarokan (kurdî/almanî), partiyek, nexweşxane, weqfen-xêrxwaziyê, bank, nivisgehek navendî, radyo, tv, rojname, kovar û malperên profesyonel ji civaka xwe re danemezrandibin! **Gelo, hingê ne normale ku ne civak, ne partiyên KURD û ne jî Almanya Êzdiyan dilsoz digrin, van dihesib?**
- Bêguman, demoqrasiya Almanyayê û ya Tirkiyê ne wekhev in. Lê, li herdû welatan jî Êzdî ji mafê wekheviyê bê par in! Êzdî (80%) hemwelatî ne û TEV bacê didin dewletê. Lê, Almanya “ol û ziman” ê Êzdiyan bi fermî qebûl nake, wan ji sûdwergirtina hemwelatiyê bê par dihêle û şûrê “întegrasyona-yekalî” bikartîne. Gellek Êzdî û hinek rêxistinên[14] Êzdîyan jî peznên vê întegrasyonê

[12] Mînake: 1 pêzanîna zimanê kurdî/almanî *(axaftin, xwendin û nivisandin)*, 2 jiyanek rasteqîn, 3 pêzanîna dîrok, çand û baweriya Êzdiyan, 4 şexsiyetek xêrxwaz û visyonger, 5 demê, 6 pêzanînên siyaseta Almanyayê, 7 aborî.
[13] Têolojiya Êzdiyatiyê ha vedibêje: „Şêx û Pîr“ li RÊ – mirîd li PÊ“.
[14] Pirraniya mal û komelên Êzdiyan xebatên têkelbûnê ji kîsî xwe ve dikin û nayên vexwendin bo konferensên têkelbûnê, ji sûdwergirtinên piralî bêparin, binêr https://www.nrz.de/staedte/kleve-und-umland/hueseyin-ezer-kuemmert-siç-um-integrationsfragen-in-kleve-id217465153.html

didin! Mînak: Almanya *(2006)* "DIK-Deutsche Îslam Konfernez" damezrand û pê re tifaqa rêxistin/serkomelên misilman afirand. Mafê wekhevî tine be, dê pêşeroja Êzdiyan cewa misoger be? **Gelo, mifta serkeftinê ne "YEKÎTÎ" ye?**

- Zimanê Almanî bişaftin û dûbendiyek mezin xistiye nav civak û rêxistinên Êzdiyan. Pirr berpirs û rêxistinên Êzdiyan kêm bi wate û girîngiya zimanê kurdî serwext in, hîn kêmtir bi kurdî dinivsînin û dixwînin. Êzdiyatî bê "kurdî" ne tê parastin, ne tê fêmkirin û ne jî jiyan kirin! **Gelo, "berpirs, akademîker û dûnav" ên ku pirr kêm bi kurdî dinas in, difikrin û dixwînin hîngê kî û ci diparêzin?**

**Dr. Celalettin Kartal** li ser "ziman" wiha vedibêje: *"...ziman ne tenê alavekî ragihandinê ye. Ziman ne alavekî "bê alî" ye. Ziman parastin û hebûna nasmana netew û kêmnetewan e. Ziman desthilatdarî ye, ziman îdêolojî, hişmendî û çanda netewî ye. Ziman bandora dêbavên zarokan e. Ziman "çeka" girîngtirîn e. Ziman dîrok, ol û tijî gotinên pêşiyan e. Yê dev ji zimanê xwe berde, dev ji hebûna xwe jî berdide...".*

Tifaqê ne tiştekî batinî yan zor e**, tifaq ne rêya tawanbariye, ew berî hertiştî dilsozî û kirine!** Rewşa rast ya ziman, ol, civak û pirraniya rêxistinên Êzdiyan li Almanyayê karasat e. Li dijî vê rastiyê, pirraniya berpirs û dûnavên Êzdiyan di axaftinên xwe de behsa serkeftinan[15] li Almanyayê dikin. Bi gotin û kirinên "şaş û qopî", belavkirina agahdariyên ne rast, bêtifaqiyê û bişaftinê diafrînin. Ev, ji hevî û pirsgrêkên civak û endamên xwe bêtir – bi parastin û misogerkirna **"pile û postên"** xwe ve mijûl in! Ji "xeta" rêxistin, civak û ola ku ji wan re rêzdar e, bêtir ev li gor "şexsiyet, texmîn û berjewendiyên xwe diaxifin, difikrin û dixebitin. Şexsiyet, berpirs û rêxistinên ne serkeftî tawanbariya "Êzdî bê tifaq in" wek "şûr" li dijî civakê bikar tînin û ha jî bi hêsanî XWE diparêzin. Bi belavkirina agahdariyên ne rast civak nikare bi hêsanî êdî "rastiyê" nas bike û ha jî "hesab" ji berpirsên "tekçûna civakê, bêtifaqiya rêxistinên Êzdiyan, bişaftina olê û valakirina Êzdîxanê[16]" bixwaze.

Renge ku vêga bêtirî 200.000 Êzdî li Almanyayê dijîn – lê mixabin, hîna ev hejmara mezin ji bo misogerkirina "hebûna" Êzdiyan li welat û li Almanyayê nehatiye birêxistinkirin. Bi ya min, di demek nêzîk de, emê bêtir encamên "fermana-sipî" bibîn in. Heman tişt wê ziyanek gewre bide tevaya Êzdiya û doza Kurdistanê. Herwiha bi hezaran zarok, ciwan û malbat wê ji ola û netewa xwe dûrbikevin. Ma hêj jî wext nehatiye, ku berpirsên hemû mal, rêxistin û serkomelên Êzdiyan wek mînak bi damezrandina **"Kongra Êzdıyên Cîhanê"** soz û armanca xwe ya tifaqê pêk bînin?

## Dawî û jêderxistin

**Ez çûm diwana îlahî, min lê dît xweşî û şahî – serê hemû tiştî, tifaq û tevahî!** Wek bi mînakên ji dîrokê û rewşa serdem "bi gelemperî" hat diyar kirin, **"halê Êzdîyan ticar wek îroj li Almanyayê xweş nebû û di heman demê de jî, wek îroj xirab nebû"**. Hinek Êzdî bi xwendin û aboriyê pêşketibin jî, lê Êzdiyatî bi tinebûne re rû-bi-rû maye.

**Ne pirrî û pirr kirin, lê kirinên rast, bi qelîte û sûd girîng in!** Bêguman, di 30 salên dawî de, ji hêlekê ve li gor rewşa li welat Êzdiyan pirr tişt kirin. Îmkan afirandin, mal û rêxistin damezrandin. Lê li gor fersend û îmkanên li Almanyayê heyî, pirr kêm xwe pêşxistin, perwerde kirin û pirtûk hw. lêkolînen zanistê weşandin. Loma, ji qezençkirina serkeftin û destkeftinan

[15] Sokrates ha vedibêje: *„**Yê ku bawer dike ku buye tiştek – dev jê berdaye ku bibe tiştek**"*.

[16] Gellek rêxistin û şexsiyetên Êzdiyan *(zanin/nezanî)* berê Êzdiyên Îraq, Sûryê û başûrê Kurdistanê didin revendê, wiha jî yek ji armancên DAIŞê yên serekî pêktînin, erdê Êzdiyan û li dawî jî Lalişa Nûranî ji misilmana re dihêlin. Encam: Êzdiyên li welat mayî tên lawaz kirin û yên revendê jî tên bişaftin.

bêtir wundakirin heye. Ev bû 30 sal, ku berpirs û rêxistinên Êzdiyan behsa girîngî û pêkanîna “tifaqê” dikin, lê hîna jî ev bi xwe ne amadene vê soz û “qaşo” armanca xwe pêkbînin.

Îroj pirr “serok, berpirs û akademîker” hene, lê Êzdî ji berjewendiyên xwe bêtir li dû berjewendiyên bîan û **“pezê bê şîvan”** in.

Jiyana Êzdiyatiyê li revendê bi giştî serobîna biye, ji dûnavan bêtir yeknav parastin û berpirsyariya olî û behsa reforman dikin. Lê ya rast eve, ku ne yeknav û ne jî dûnav pîvan û erkê xwe bi têrî dinasin û pêktînin. Di 50 salên dawî de gellek tiştên ne pirr girîng hatine kirin lê yên herî girîng wek mînak “afirandina çarçovek kifşkirî” ji bona ji nû ve zindî kirina “jiyana Êzdiyatiyê” û misogerkirina vê, pêk ne anîn e!!! Pirraniya rêxistinên heyî ne profesyonel in û ne jî xwe li gor îmkanên heyî ji bona profesyonel perwerde dikin. Wiha jî mixabin berjewendiyên Êzdiyan û Êzdiyatiyê bi “xetek-sor” nayê şopandin û qontrolkirin. **Mirovê pispor, yan yê baş perwerdekirî dikare civak û rêxistina xwe pêşve bibe – mirovê ne-perwerdekirî dikare civak û rêxistina xwe têkdibe!**

Ji bilî cend rêxistinên profesyonel, rewşa hemû rêxistinên Êzdiyan “kêm/zêde” wekhev û karasate. Wek ku hat diyar kirin bi vê rewşa xwe, ne berpirs, ne komele û ne jî serkomelên Êzdiyan vêga amadene bi rêkûpêkî û berpirsyariyek navendî Êzdiyatiyê rêvebibin yan jî pirsgirêkên-navendî çareser bikin. Loma, divê hemû endam, civak û bi taybetî jî ciwanên Êzdî li berpirsyariya xwe ya dîrokî ji bona “miletê Tawisî-Melek” berpirsyar bibînin. Bêtir berpirs, rêxistin, rêvebirîn, akademîker û dûnav ên xwe bişopînin, qontrol bikin û hevkar bin bi wan re. **Deng, Maf û pêşeroja xwe “hêsan” nedin destê kesî!**

**Zargotina Êzdiyan** wiha di nivîs e**: “Here ba wî, yê te digrîne, lê neçe ba wî yê te dikenîne”.** Min di nivisa xwe de hewl da bidim zanîn ku “Êzdiyên-Sêwî” di welatê xwe de bi “FERMANA REŞ” û li revendê jî bi “FERMANA SIPÎ” re rû-bi-rû man e! Ji bona vê rewşê ne tenê kokdijminên kurda berpirsyarin. Wekî ku rewş û baredox wiha ye, **hîngê EM dikarin behsa „serkeftinan“ bikin?**

Min afo bikin, lê heta rastî ev be, ezê behsa serkeftina “şexsiyet, mal û komelên” Êzdiyan nekim – hemû xebat û serkeftinên “bicûk” tenê wek agirkujiyê binîrxînim.

Xwedê û Tawisî-Melek rêşandarê rast û rasteqîna bin, xebat û xîreta wan bi serkeftinê xelat bikin!

Dr. phil. Xelîl Savucu

01.07.2019